EUROPEAN UNION AGENCY FOR ASYLUM

# ŞOPANDINA MALBATÊ (ZAROK)

# FORM

Destnivîs di sala 2025-an de hatiye temamkirin
Ne Ajansa Yekîtiya Ewropayê ji bo Penaberiyê (EUAA) ne jî kesekî ku li ser navê EUAA-yê tevdigere, ji bikaranîna agahiyên di vê weşanê de berpirsiyar nîne.
Lûksembûrg: Ofîsa Weşanan a Yekîtiya Ewropayê, 2025

PDF ISBN 978-92-9410-792-3 doi:10.2847/9629004 BZ-01-25-035-EN-N

© Ajansa Yekîtiya Ewropayê ji bo Penaberiyê (EUAA), 2025
Heke çavkanî were nîşandan, nûberhemanîn destûrdayî ye.

| | |
|---|---|
| **Navê welatê +EU** | |
| **Navnîşana rayedarê neteweyî** | |
| **Agahiyên taybet ên welatê +EU li ser çawaniya şandinê û cihê şandina vê formê** | *Ev der ji bo welatên +EU cihê vala ye ku rêbazên têkildarî şandina vê formê têxin nav de.*<br>*Divê ev form çawa were şandin? Ji bo kîjan navnîşanê? Heya kengî?* |

# FORMA ŞOPANDINA MALBATÊ (ZAROK)

Divê ev form ([1]) ji aliyê wasî/nûner ([2]) yê zarok ve were dagirtin. Wasî/nûner divê formê heta dawiyê bi zarok re bixwîne û hemû hûrguliyan rave bike.

## ÇIMA EV FORM JI MIN RE HATIYE DAYÎN?

Tu li welatekî biyanî yî û tu bi tenê yî. Welatê Endam dixwaze lêkolîn bike ka endamên malbata te li Welatekî Endam ê Yekîtiya Ewropayê an welatekî hevkar (wekî welatên +EU têne binavkirin) hene an na.

| |
|---|
| Welatên Endamên Yekîtiya Ewropayê ev in: Belçîka, Bulgaristan, Çekya, Danîmarka, Almanya, Estonya, Îrlanda, Yewnanistan, Îspanya, Fransa, Xirwatistan, Îtalya, Qibris, Letonya, Lîtvanya, Lûksembûrg, Macaristan, Malta, Holanda, Awistirya, Polonya, Portûgal, Romanya, Slovenya, Slovakya, Fînlenda û Swêd. Çar welatên hevkar Îzlenda, Liechtenstein, Norwêc û Swîsre ne. |

Rayedarên li vî welatî dixwazin alîkariya te bikin ku tu malbata xwe bibînî û careke din bi wan re bibî yek. Ji ber vê yekê vê formê didin te ku tu dagirî. Divê tu agahiyên li ser malbata xwe bidî rayedarên vî welatî, wekî ew kî ne, li ku dijîn û tu çawa dikarî bi wan re têkilî deynî.

Ne hewce ye ku tu bi tenê formê dagirî. Alîkarekî taybet, ku jê re wasî tê gotin, dê alîkariya te bike. Heke tu hewceyî bêtir alîkariyê bî, tu dikarî ji kesên din jî bipirsî, wekî berpirsên dozê, karmendên pêşwaziyê û şêwirmendên qanûnî.

## ÇIMA JI MIN HATIYE XWESTIN KU EZ VÊ FORMÊ DAGIRIM?

Pêdivî ye ku rayedarên vî welatî bizanin ka endamên malbata te li yek ji welatên EU+ hene an na. Heke hebin, dibe ku welatê ku ew lê dijîn ji birêvebirina serlêdana te berpirsiyar be.

Her wiha rayedarên vî welatî dixwazin alîkariya te bikin ku tu bi endamên malbata xwe re li welatên +EU bibî yek, heke ji bo te baş be ku tu bi wan re bî. Heke tu dixwazî bi endamên malbata xwe re bibî yek, me agahdar bike û em ê lêkolîn bikin ka ev mimkun e an na û em ê hewl bidin ku vê yekê pêk bînin. Heke tu difikirî ku ji bo te ne baş e ku tu bibî yek, di zûtirîn dem de ji me re bêje.

([1]) PDF: BZ-01-25-007-EN-N û Çap: BZ-01-25-007-EN-C.
([2]) Di vê formê de, li gorî çarçoveya qanûnî ya ku di EUAA, *Rêberê Pratik li ser Şopandina Malbatê*, 2025, Beşa 'Termînolojî' de hatiye diyarkirin, têgehên 'nûner' û 'wasî' li şûna hev têne bikaranîn.

### Ez dikarim bi kê re bibim yek?

Tu dikarî bi endamekî malbatê, xwişk/bira an xizmekî re bibî yek. Dê ji te bê pirsîn ka tu dixwazî bibî yek an na.

Li gorî qanûna Yekîtiya Ewropayê, **endamên malbata** te ev in:
- dê û bavê te.

**Xwişk û birayên** te ev in:
- birayê te
- xwişka te.

**Xzimên** te ev in:
- meta/xaltiya te
- mamê/xalê te
- dapîra te
- bapîrê te.

**Heke endamekî malbata te li welatekî +EU hebe, van mafên te yên jêrîn hene.**
- Dê girîngiya pêşîn (priorîtê) bidin doza te.
- Tu dikarî daxwaza agahiyê ji kes û saziyên ku dikarin di dagirtina vê formê de alîkariya te bikin bikî.
- Tu dikarî daxwaza agahiyê li ser rêxistinên neteweyî, navdewletî û rêxistinên din ên têkildar bikî yên ku dikarin tespîtkirin û şopandina endamên malbata te hêsan bikin.
- Hevpeyvînek dikare bê organîzekirin da ku welatê +EU yê berpirsiyar ji bo lêkolîna serlêdana te ya parastina navdewletî were diyarkirin, heya ku hincetên betalkirina hevpeyvînê nebin.
- Tu dikarî her agahiyeke ku dikare alîkariya tespîtkirina hebûna endamên malbatê bike, bi devkî an bi belgeyan pêşkêş bikî.
- Tu dikarî li ser doza xwe daxwaza bêtir agahiyê bikî.

## DIVÊ EZ ÇI AGAHIYAN TÊXIM NAV VÊ FORMÊ?

Dema ku tu formê dagirî, dê li ser endamên malbata te ji te bê pirsîn, wekî dê, bav, bira, xwişk, met, xal, dapîr û bapîrên te. Her wiha divê tu ji rayedarên vî welatî re bêjî ka ew li ku dijîn û tu çawa dikarî bi wan re têkilî deynî.

### Çima ev agahî girîng in?

Tu çiqas bêtir agahî bidî, ji bo rayedarên vî welatî ewqas hêsantir e ku bi rayedarên welatê ku endamê malbata te lê ye re têkilî deynin, têkiliya we piştrast bikin û di zûtirîn dem de we bînin cem hev.

Dibe ku tu ji bo hevpeyvînekê bêyî vexwendin an jî pirsên din ji te werin pirsîn da ku bêtir li ser têkiliyê û cihê wî kesî agahî werin girtin.

Xem neke heke hemû agahî li cem te nebin. Bi wasiyê xwe re, bi qasî ku pêkan e formê dagire û rayedarên vî welatî dê herî baş bikin da ku pêvajoyê bidin destpêkirin. Heke belgeyên te hebin, wasiyê te dê di zûtirîn dem de wan bişîne.

## DAGIRTINA VÊ FORMÊ ÇAWA DIBE?

Wasiyê te dê **Beşa 1** a formê dagire. Ev beş **agahiyên te yên kesane** kom dike. Beşa 1 tenê carekê divê were dagirtin.

**Gava 1.** Beşa 1-ê ya formê dagire. Ev beş agahiyên te yên kesane kom dike.

**Gava 2.** Ji bo her endamekî malbatê, beşa/beşên formê yên têkildarî endamê/ên malbata xwe dagire.

- Dê û bavê te: dayîk an bavê te (Beşa 2).
  *Heke her du dê û bavên te li welatekî an bêtir welatên +EU bin, vê beşa formê ji bo her yekî ji wan dagire.*
- Xwişk an birayê te: bira an xwişk (Beşa 3).
  *Heke gelek xwişk û birayên te li welatên +EU hebin, vê beşa formê ji bo her yekî ji wan dagire.*
- Xizmên te: mam/xalo, met/xaltî, dapîr/bapîr (Beşa 4).
  *Heke gelek xizmên te li welatên +EU hebin, vê beşa formê ji bo her xizmekî dagire.*
- Têkiliyên din ên malbatê (Beşa 5).
  *Heke têkiliyên te yên din ên malbatê li welatên +EU hebin, vê beşa formê ji bo her têkiliyê dagire.*

**Gava 3.** Dara malbata xwe xêz bike (Beşa 6) da ku hemû endamên malbatê nîşan bidî. Ev dikare ji bo hewildanên şopandina malbatê ya di pêşerojê de an ji bo fêmkirina ka kesên din hene ku yekbûna malbatê pê re were destpêkirin, bikêr be.

**Bi bîr bîne.** Ji bo her endamekî malbatê, wasiyê te dê beşa têkildar a formê (**Beşên 2 heta 5**) dagire. **Beşa 6** bikar bîne da ku dara malbata xwe xêz bikî û hemû endamên malbata xwe nîşan bidî.

## KÎ DIKARE DI DAGIRTINA FORMÊ DE ALÎKARIYA MIN BIKE?

Wasiyê te dê formê bi te re dagire. Ew ê hemû agahiyên pêwîst bi awayekî ku tu fêm bikî ji te re bêjin da ku tu bikaribî mafên xwe bi kar bînî. Tu dikarî her gav li ser her tiştê ku hewcedariya te pê heye bi wasiyê xwe re biaxivî. Berpirsên dozê an karmendên pêşwaziyê jî dikarin alîkariya te bikin. Tu dikarî ji şêwirmendên qanûnî û wergêran jî alîkariyê bixwazî. Heke tu tiştekî fêm nekî, ji rayedarên vî welatî bipirse.

*Agahiyên taybet ên welatê +EU li ser KES û SAZIYÊN ku di temamkirina şablonê de alîkariyê didin û ŞÊWIRMENDIYA QANÛNÎ.*

## EZ DIKARIM ÇAWA BI ENDAMÊ MALBATA XWE RE BIBIM YEK?

Piştî ku tu formê dagirî, rayedar dê li agahiyan binerin û hewl bidin malbata te bibînin. Dibe ku ew hinek pirsên din ji te bipirsin an te ji bo hevpeyvînek din vexwînin. Heke ew malbata te bibînin, dê alîkariya te bikin ku tu bi wan re bibî yek. Her wiha ew ê bixwazin piştrast bikin ku ji bo te ewle û baş e ku tu li cem malbata xwe bî. Ew ê herî baş bikin da ku piştrast bikin ku tu di ewlehiyê de yî. Heke ji bo te ne ewle be, yekbûn dê neyê destpêkirin.

Di dema vê nirxandinê de, nêrînên te dê werin girtin lê biryarên li ser yekbûnê dê li ser bingeha tiştê ku ji bo ewlehî û xweşiya te herî baş e werin girtin. Heke tu dixwazî bi dê, bav, xwişk an bira, met, xal, dapîr an bapîrê xwe re bibî yek, divê tu ji rayedaran re bêjî. Her wiha heke tu difikirî ku ji bo te ne baş e ku tu tevlî wan bibî, divê tu ji wan re bêjî.

**Bi bîr bîne**. Doza te taybet e. Ev tê wê wateyê ku heke di doza te de yekbûna malbatê were destpêkirin, rayedar dê di zûtirîn dem de wê bişopînin, da ku tu zêde li bendê nemînî.

## EZ NIZANIM ENDAMÊ MALBATA MIN LI KU YE. HÛN DIKARIN ALÎKARIYA MIN BIKIN?

Heke tu zanibî ku endamê malbata te, xwişk/birayê te an xizmê te li welatekî +EU ye lê tu ne ewle bî ka li ku derê ne, tu dikarî daxwaza piştgiriyê ji rêxistinên şopandina malbatê bikî yên ku dikarin alîkariya te bikin ku tu endamê malbata xwe bibînî. Wasiyê te dê alîkariya te bike ku tu xwe bigihînî van rêxistinan. Heke tu hewceyî piştgiriyeke wiha bî, ji rayedarên vî welatî re bêje.

*Agahiyên taybet ên welatê +EU li ser rêxistinên şopandina malbatê.*

## AGAHIYÊN KU EZ DIDIM DÊ ÇAWA WERIN PARASTIN?

Agahiyên ku tu didî dê bi nepenî werin girtin. Ew ê tu carî bi welatekî ku di lîsteya welatên +EU de nîne (li rûpela 1-ê ya vê formê binihêre) an bi welatê jêderk an cihê ku te an endamê malbata te lê dijiyan re neyên parvekirin. Agahî dê bi awayekî ewle tenê ji welatê +EU re were şandin ku endamê malbata te lê ye, da ku rayedarên wî welatî karibin diyar bikin ka têkiliya we ji bo yekbûna malbatê guncan e an na. Heke hewce bike, dibe ku ji bo pirsên din, rayedar an rêxistin bi endamê malbata te re têkilî deynin.

## BEŞA 1. AGAHIYÊN KESANE YÊN ZAROK

| | |
|---|---|
| **Hejmara dozê:** | |
| Nav | |
| Paşnav | |
| Temen | |
| Zayend | |
| Dîroka ji dayikbûnê (roj/meh/sal) | |
| Cihê ji dayikbûnê | |
| Dîroka derketina ji welatê jêderk | |
| Netewe (Hemwelatîbûn) | |
| Navnîşan/stargeh | |
| Agahiyên têkiliyê (navnîşana e-peyamberê, hesabê medyaya civakî, hejmara telefonê) | |
| **Agahiyên têkiliyê yên wasî** | |
| Nav | |
| Paşnav | |
| Hejmara telefonê | |
| Navnîşana e-peyamberê | |
| ☐ **Ez piştrast dikim ku endamekî malbata min heye ku li welatekî +EU dimîne.** | |
| Endamê malbata min ev e (zêdetirî vebijarkek dikare bibe hilbijartin) | ☐ dê an bavê min (dayîk an bav) (Beşa 1)<br>☐ xwişk an birayê min (xwişk an bira) (Beşa 2)<br>☐ meta/xaltîya min an mamê/xalê min (Beşa 3)<br>☐ dapîr an bapîrê min (dapîr an bapîr) (Beşa 4)<br>☐ têkiliyên din ên malbatê (Beşa 5) (ji kerema xwe diyar bike): |
| Agahiyên din ên têkildar | |
| **Dîrok û îmzeya wasî/nûner** | |

## BEŞA 2. AGAHIYÊN KESANE YÊN DÊ AN BAV

*Heke her du dê û bavên zarok li welatekî an bêtir welatên +EU bin, bişkoka 'Beşê dubare bike' bitikîne da ku ji bo her kesekî beşeke nû çêbikî.*

| | |
|---|---|
| Nav | |
| Paşnav | |
| Navên din ên hatine bikaranîn | |
| Temen | |
| Zayend | |
| Dîroka ji dayikbûnê (roj/meh/sal) | |
| Cihê ji dayikbûnê | |
| Têkilî | ☐ dayîk<br>☐ dêmarî<br>☐ bav<br>☐ bavmarî |
| Cihê niha an cihê herî dawî yê tê zanîn li +EU (welat, bajar) | |
| Statuya rûniştinê ya kesê li welatê +EU | ☐ serlêderê parastina navdewletî<br>☐ sûdmendê parastina navdewletî<br>☐ rûniştina demdirêj<br>☐ rûniştvan<br>☐ hemwelatî<br>☐ nayê zanîn |
| Dîroka derketina ji welatê jêderk | |
| Netewe (Hemwelatîbûn) | |
| Hejmara kesane / hejmara dozê (heke hejmareke nasnameyê li welatê +EU hebe) | |
| Navnîşan/stargeh | |
| Agahiyên têkiliyê (navnîşana e-peyamberê, hesabê medyaya civakî, hejmara telefonê) | |

**Daxwaza ji bo yekbûnê**

Tu dixwazî bi vî kesî re bibî yek?
☐ Erê, ez dixwazim bibim yek.
☐ Na, ez naxwazim bibim yek.
Heke tu naxwazî bibî yek, tu dikarî sedemê wê rave bikî. Ev agahî dê bi nepenî werin girtin.

*Ji kerema xwe agahdar be ku dibe ku tu nekarî hilbijêrî ka tu yê li ku bijî, ji ber ku biryarên li ser yekbûnê dê li ser bingeha nirxandina tiştê ku ji bo ewlehî û xweşiya te herî baş e werin girtin.*

**Cara dawî te kengî û li ku derê bi vî kesî re têkilî danî?**

| **Gelo kesekî din heye ku dibe ku cihê endamê malbata te bizanibe? Heke hebe, ji kerema xwe agahiyên wan ên têkiliyê bidî. Te bi vî kesî re têkilî daniye?** |
| --- |
| |
| **Te ji bo peydakirina vî kesî bi tu rêxistinan re têkilî daniye?** ***Heke erê, ji kerema xwe rave bike (navê rêxistinê, statuya şopandinê / encam).*** |
| |
| **Belge/delîlên ku têkiliyê îsbat dikin û li cem te hene rave bike.**<br>Wekî mînak, sertîfîkaya zewacê, nasnameya ji dayikbûnê, kopiya belgeyên nasnameyê, wêneyên endamê malbatê, û hwd. Dê ji te were xwestin ku tu van belgeyan an van delîlan bişînî. |
| |
| **Agahiyên din ên têkildar** |
| |

Beşê dubare bike

## BEŞA 3. AGAHIYÊN KESANE YÊN XWIŞK AN BIRAYÊ/A

*Heke gelek xwişk û birayên zarok li welatên +EU hebin, bişkoka 'Beşê dubare bike' bitikîne da ku ji bo her kesekî beşeke nû çêbikî.*

| | |
|---|---|
| Nav | |
| Paşnav | |
| Navên din ên hatine bikaranîn | |
| Temen | |
| Zayend | |
| Dîroka ji dayikbûnê (roj/meh/sal) | |
| Cihê ji dayikbûnê | |
| Têkilî | ☐ xwişk<br>☐ xwişka ji dê (ne ji bav)<br>☐ xwişka ji bav (ne ji dê)<br>☐ xwişkmarî (ji aliyê dê ve)<br>☐ xwişkmarî (ji aliyê bav ve)<br>☐ bira<br>☐ birayê ji dê (ne ji bav)<br>☐ birayê ji bav (ne ji dê)<br>☐ biramarî (ji aliyê dê ve)<br>☐ biramarî (ji aliyê bav ve) |
| Cihê niha an cihê herî dawî yê tê zanîn li +EU (welat, bajar) | |
| Statuya rûniştinê ya kesê li welatê +EU | ☐ serlêderê parastina navdewletî<br>☐ sûdmendê parastina navdewletî<br>☐ rûniştina demdirêj<br>☐ rûniştvan<br>☐ hemwelatî<br>☐ nayê zanîn |
| Dîroka derketina ji welatê jêderk | |
| Netewe (Hemwelatîbûn) | |
| Hejmara kesane / hejmara dozê (heke hejmareke nasnameyê li welatê +EU hebe) | |
| Navnîşan/stargeh | |
| Agahiyên têkiliyê (navnîşana e-peyamberê, hesabê medyaya civakî, hejmara telefonê) | |

**Daxwaza ji bo yekbûnê**

Tu dixwazî bi vî kesî re bibî yek?

☐ Erê, ez dixwazim bibim yek.

☐ Na, ez naxwazim bibim yek.

Heke tu naxwazî bibî yek, tu dikarî sedemê wê rave bikî. Ev agahî dê bi nepenî werin girtin.

| **Cara dawî te kengî û li ku derê bi vî kesî re têkilî danî?** |
|---|
| |
| **Gelo kesekî din heye ku dibe ku cihê endamê malbata te bizanibe? Heke hebe, ji kerema xwe agahiyên wan ên têkiliyê bidî. Te bi vî kesî re têkilî daniye?** |
| |
| **Te ji bo peydakirina vî kesî bi tu rêxistinan re têkilî daniye?** ***Heke erê, ji kerema xwe rave bike (navê rêxistinê, statuya şopandinê / encam).*** |
| |
| **Belge/delîlên ku têkiliyê îsbat dikin û li cem te hene rave bike.** Wekî mînak, sertîfîkaya zewacê, nasnameya ji dayikbûnê, kopiya belgeyên nasnameyê, wêneyên endamê malbatê, û hwd. Dê ji te were xwestin ku tu van belgeyan an van delîlan bişînî. |
| |
| **Agahiyên din ên têkildar** |
| |

Beşê dubare bike

## BEŞA 4. AGAHIYÊN KESANE YÊN XZIMÊ/A

*Heke gelek xizmên zarok li welatên +EU hebin, bişkoka 'Beşê dubare bike' bitikîne da ku ji bo her kesekî beşeke nû çêbikî.*

| | |
|---|---|
| Nav | |
| Paşnav | |
| Navên din ên hatine bikaranîn | |
| Temen | |
| Zayend | |
| Dîroka ji dayikbûnê (roj/meh/sal) | |
| Cihê ji dayikbûnê | |
| Têkilî | ☐ xaltî<br>☐ xalo<br>☐ dapîra ji aliyê dê ve<br>☐ bapîrê ji aliyê dê ve<br>☐ met<br>☐ mam<br>☐ dapîra ji aliyê bav ve<br>☐ bapîrê ji aliyê bav ve |
| Cihê niha li welatên +EU (welat, bajar) | |
| Statuya rûniştinê ya kesê li welatê +EU | ☐ serlêderê parastina navdewletî<br>☐ sûdmendê parastina navdewletî<br>☐ rûniştina demdirêj<br>☐ rûniştvan<br>☐ hemwelatî<br>☐ nayê zanîn |
| Dîroka derketina ji welatê jêderk | |
| Netewe (Hemwelatîbûn) | |
| Hejmara kesane / hejmara dozê (heke hejmareke nasnameyê li welatê +EU hebe) | |
| Navnîşan/stargeh | |
| Agahiyên têkiliyê (navnîşana e-peyamberê, hesabê medyaya civakî, hejmara telefonê) | |

**Daxwaza ji bo yekbûnê**

Tu dixwazî bi vî kesî re bibî yek?

☐ Erê, ez dixwazim bibim yek.

☐ Na, ez naxwazim bibim yek.

Heke tu naxwazî bibî yek, tu dikarî sedemê wê rave bikî. Agahî dê bi nepenî werin girtin.

| **Cara dawî te kengî û li ku derê bi vî kesî re têkilî danî?** |
|---|
| |
| **Gelo kesekî din heye ku dibe ku cihê endamê malbata te bizanibe? Heke hebe, ji kerema xwe agahiyên wan ên têkiliyê bidî. Te bi vî kesî re têkilî daniye?** |
| |
| **Te ji bo peydakirina vî kesî bi tu rêxistinan re têkilî daniye? *Heke erê, ji kerema xwe rave bike (navê rêxistinê, statuya şopandinê / encam).*** |
| |
| **Belge/delîlên ku têkiliyê îsbat dikin û li cem te hene rave bike.**<br>Wekî mînak, sertîfîkaya zewacê, nasnameya ji dayikbûnê, kopiya belgeyên nasnameyê, wêneyên endamê malbatê, û hwd. Dê ji te were xwestin ku tu van belgeyan an van delîlan bişînî. |
| |
| **Agahiyên din ên têkildar** |
| |

Beşê dubare bike

## BEŞA 5. AGAHIYÊN KESANE YÊN KESÊ/A DIN Ê/A TÊKILDAR

*Heke gelek têkiliyên din ên zarok li welatên +EU hebin, bişkoka 'Beşê dubare bike' bitikîne da ku ji bo her kesekî beşeke nû çêbikî.*

| | |
|---|---|
| Nav | |
| Paşnav | |
| Navên din ên hatine bikaranîn | |
| Temen | |
| Zayend | |
| Dîroka ji dayikbûnê | |
| Cihê ji dayikbûnê | |
| Cureyê têkiliyê / girêdana malbatê | |
| Cihê niha li welatên +EU (welat, bajar) | |
| Statuya rûniştinê ya kesê li welatê +EU | ☐ serlêderê parastina navdewletî<br>☐ sûdmendê parastina navdewletî<br>☐ rûniştina demdirêj<br>☐ rûniştvan<br>☐ hemwelatî<br>☐ nayê zanîn |
| Dîroka derketina ji welatê jêderk | |
| Netewe (Hemwelatîbûn) | |
| Hejmara kesane / hejmara dozê (heke hejmareke nasnameyê li welatê +EU hebe) | |
| Navnîşan/stargeh | |
| Agahiyên têkiliyê (navnîşana e-peyamberê, hesabê medyaya civakî, hejmara telefonê) | |

**Daxwaza ji bo yekbûnê**

Tu dixwazî bi vî kesî re bibî yek?

☐ Erê, ez dixwazim bibim yek.

☐ Na, ez naxwazim bibim yek.

Heke tu naxwazî bibî yek, tu dikarî sedemê wê rave bikî. Ev agahî dê bi nepenî werin girtin.


**Cara dawî te kengî û li ku derê bi vî kesî re têkilî danî?**

| **Gelo kesekî din heye ku dibe ku cihê endamê malbata te bizanibe? Heke hebe, ji kerema xwe agahiyên wan ên têkiliyê bidî. Te bi vî kesî re têkilî daniye?** |
|---|
| |
| **Te ji bo peydakirina vî kesî bi tu rêxistinan re têkilî daniye? *Heke erê, ji kerema xwe rave bike (navê rêxistinê, statuya şopandinê / encam).*** |
| |
| **Belge/delîlên ku têkiliyê îsbat dikin û li cem te hene rave bike.**<br>Wekî mînak, sertîfîkaya zewacê, nasnameya ji dayikbûnê, kopiya belgeyên nasnameyê, wêneyên endamê malbatê, û hwd. Dê ji te were xwestin ku tu van belgeyan an van delîlan bişînî. |
| |
| **Agahiyên din ên têkildar** |
| |

Beşê dubare bike

## BEŞA 6. DARA MALBATÊ

Tu dikarî dara malbata xwe di qutiya jêrîn de xêz bikî. Bawer be ku tu endamên malbata xwe, xwişk û bira û xizmên xwe diyar dikî. Heke mimkun be, diyar bike ka endamê malbata te niha li kîjan welatî dimîne. Mînakeke dara malbata te di fîgura jêrîn de tê nîşandan.




***Agahiyên têkildarî her endamekî din ê malbatê di vê beşê de binivîse***